



DESTNIVÎSÊN MEWLÛDA MELAYÊ BATEYÎ DI ARŞÎVA A. JABA DE: NASANDIN Û ANALÎZ

Abdurrahman ADAK*

KURTE

Mewlûda Melayê Bateyî berhemêke girîng a edebiyata Kurdî ya klasîk e. Her çiqas ji aliyê gelek dîsîplînên zanistên sosyal ve li ser Mewlûdê xebat dikarin bîn kirin jî berî her tiştî, ji aliyê dîsîplîna destnivîsariyê ve divê xebat bîn kirin û li ser esasê nusxeyên destnivîs divê metneke durist û zanistî bê amadekirin. Nasandina nusxeyên destnivîs û analîza wan (nirxê nusxeyê, şecereya nusxeyan) di pêvajoya amadekirina metna zanistî ya berhemê de du karên pêşî ne ku divê bîn kirin. Di arşîva A. Jaba de sê nusxeyên Mewlûda Bateyî hene ku yek ji wan di nav hemû nusxeyên ku tên zanîn de ya herî kevin e. Heta niha yazdeh nusxeyên Mewlûdê yên ku di qonaxa berî Şerê Cihanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin, tên zanîn ku sê heb ji van di arşîva A. Jaba de tên parastin. Di vê gotarê de ji aliyekî ve bi hûrgilî ev her sê nusxe hatine nasandin û analîza wan hatiye kirin, ji aliyekî ve jî rola arşîva Jaba di parastina wan nusxeyan de li ber çavan hatiye raxistin.

Bêjeyên Sereke: destnivîsarî, Mewlûda Bateyî, arşîva A. Jaba, nirxê nusxeyê, şecereya nusxeyê.

ABSTRACT

"The Manuscript of Melayê Bateyî's Mewlûd in A. Jaba's Archives: The Introduction and the Analysis"

Melayê Bateyî's mewlûd is a significant work in Kurdish Classical Literature. Even though a variety of studies have been carried out about it by disciplines of social sciences, first of all in terms of discipline of the manuscripts, it is a must to execute more works and a scientific and coherent text should be prepared on the basis of manuscripts samples. The introduction and their analysis (the virtue of the sample, the family tree of the samples) are the two first works should be done in the process of the preparation of a scientific document to be done. Three manuscript samples exist in the A. Jaba's collection, one of which is known to be as the oldest. Up to now, eleven samples of this Mewlûd are known three of which had been studied in detail and known to exist in the archives of A. Jaba. In this article, these three manuscript samples are examined in detail and they are analyzed, afterwards. Moreover, the role that A. Jaba plays in terms of protection of the manuscripts samples have been pointed out.

Key words: codicology, Bateyî's Mewlûd, A. Jaba's archive, the virtue of the manuscript, the family tree of the manuscript.

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.
abdurrahmanadak@gmail.com

DESTPÊK

Melayê Bateyî helbestvanekî girîng ê edebiyata Kurdî ya klasîk e ku di tarîxa vê edebiyatê de mewlûda yekem ji aliyê wî ve hatiye nivîsîn. Bêguman hunermendiya Bateyî ne tenê di warê mewlûdê de ye, lêbelê mewlûda wî xwediyê hin taybetiyên xweser e. Mewlûda Bateyî di tarîxa edebiyata Kurdî de nimûneya yekem a cureya xwe ye, heta roja me ji qîmetê xwe tiştek wînda nekiriye û dikare bê gotin ku payeya “berhemeke klasîk” bi dest xistiye. Hevterîbê vê pozîsyona wê, mewlûda Bateyî heta niha bûye mijara gelek lêkolînan û guman tune ku ji vir şûnde jî demeke dirêj dê di navenda lêkolînan de cih bigire. Mewlûda Bateyî ji aliyê dîsîplînên curbicur ên wek dîn û bawerî, huner û estetîk, hizr û felsefe, çand û antropolojiyê ve dikare li ber çavan bê girtin, lêbelê di vê gotarê de em dê ji aliyê dîsîplîna destnivîsariyê ve (codicology) li ser mewlûda Bateyî rawestin.

Çawa tê zanîn, mewlûda Bateyî jî di nav de hemû berhemen berê, ji aliyê nivîskarên xwe ve bi destan hatine nivîsîn, di qonaxa berî çapxaneyê de her bi destan hatine zêdekirin û di qonaxa çapxaneyê de jî li kêleka nusxeyên çapkirî zêdekirina wan a bi destan wek kevneşopiyekê dîsa dewam kiriye. Di encamê de gelek nusxeyên wan ên destnivîs ji me re mîras mane. Tesbîtkirina cihê wan nusxeyan; berhevkirin, danasîn û analîza wan û herî dawî amadekirina metnên wan li gor rêbaza weşana metna rexneyî (edition critique) wek qadeke girîng a dîsîplîna destnivîsariyê derdikeve pêş (Ji bo agahiyên berfireh ên derheqê van qonaxan û mijarên têkildar de bnr. Esîlan 1994; el-Munecid, 1987). Bi gotina teorîsyenên navdar ên Ewropî Wellek&Warren, karên vê qadê, “karên pêşî” ne ku berî vekolînan din ên zanistî divê bîn kirin (Wellek & Warren, 1948, r. 49). Bi rastî jî berî ku ji aliyê dîsîplînên curbicur ên zanistên sosyal ve li ser berhemen destnivîs xebat bîn kirin, divê pêşî hemû nusxeyên wan ên destnivîs bîn berhevkirin û di çarçoveya wan nusxeyan de metnên wan ên durist û zanistî bîn amadekirin ku tiştê Wellek dibêje ev bixwe ye. Ev jî rasterast bi dîsîplîna destnivîsariyê re têkildar e. Eger mijar destnivîsên kurdî bin, ev tişt îcar wek pêdiviyê girîng derdikeve pêş. Çawa ku Wellek&Warren dibêjin; ev qada xebatê bi taybetî ji bo kevneşopiyên edebî yên ku materyalên wan ên edebî nivî nivî wînda bûne, pir girîng e (Wellek&Warren, 1948, r. 49). Bêguman Wellek û Warren wek nimûneya vê diyardeyê behsa Kurdî nekirine, lêbelê aşkera ye ku Kurdî nimûneyeke gelek xweş a vê tesbîta wan e. Loma eger mijar destnivîsên kurdî bin, berî her tiştî divê ev “karên pêşî” bîn kirin. Ji ber vê jî em dixwazin di vê gotarê de di çarçoveya van “karên pêşî” yên qada destnivîsariyê de li ser mewlûda Melayê Bateyî rawestin.

Bêguman heta niha metna mewlûdê, ji aliyê gelek lêkolîneran ve ji perspektîfa destnivîsariyê û li ber destnivîsên curbicur hatiye amadekirin. Di vî warê de lêkolînerên ku derdikevin pêş Sadiq B. Amêdî (Amêdî, ?), Zeynelabidîn Zinar (Zinar, 1992), Tehsîn I. Doskî (T. Doskî & M. Doskî, 2005), Huseyn Şemrexî (Şemrexî 2011), Xalid Sadîni (Sadîni, 2015) û Ziver Îlhan (Îlhan, 2014) in.

Lêbelê tê çavdêrîkirin ku di van xebatan de yan ji aliyê berhevkirina nusxeyan yan ji aliyê danasîn û analîza wan yan jî ji aliyê amadekirina metna rexneyî ve rêbazên dîsîplîna destnivîsariyê bi tevahî li ber çavan nehatine girtin. Ji ber vê di çarçoveya vê rêbazê de xebatên li ser mewlûdê wek pêdiviyekê derdikevin pêş. Aşkera ye ku di çarçoveya tevahiya nusxeyên destnivîs de amadekirina metneke zanistî ya mewlûdê ne mijara gotara me ye. Lewra ew karekî cuda ye ku di gotarekê de nagunce. Loma em ê gotara xwe ji bo karên ku di qonaxa berî weşanê de cih digirin, terxan bikin ku ew jî danasîna nusxeyên destnivîs û analîza wan e. Lêbelê ji ber ku em dixwazin van her du xalan, bi hûrgilî derxin meydanê, em ê nikaribin di gotarekê de dest bavêjin hemû nusxeyên destnivîs ên Mewlûdê. Ji ber vê jî diviyabû em gotarê bi çend nusxeyan bi sînor bikin. Di tesbîtîkirina nusxeyan de jî arşîva A. Jaba ya ku li Rûsyayê li Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê tê parastin, bû diyarker (Ji bo Jaba û arşîva wî bnr. Pîrbal, 2000, r. 3-8). Lewra vê dawiyê kopyayên dijîtal ên vê arşîvê ji aliyê Zanîngeha Mardin Artukluyê ve ji Rûsyayê hatibûn wergirtin û vê yekê pêwîst didêra ku em li ser vê arşîvê xebatên zanistî bikin. Di arşîva Jaba de sê destnivîsên kevin ên mewlûda Bateyî cih digirin ku yek ji wan jî di nav hemû nusxeyên ku tên naskirin de ya herî kevin e. Vê yekê jî em han dan ku em van her sê nusxeyan bikin mijara gotarê. Armanca me ew e ku di vê gotarê de em li gor krîterên dîsîplîna destnivîsariyê danasîn û analîza wan nusxeyên mewlûda Bateyî bikin û rola ku arşîva Jaba di parastina wan de listiyê destnîşan bikin. Hêviya me ew e ku ev xebat di şeweya danasîn û analîza nusxeyên destnivîs ên berhemên Kurdî de wek modelekê jî rol bilîze.

Di gotarê de em dê pêşî zanyariyên bingehîn derheqê Melayê Bateyî û Mewlûda wî de pêşkêş bikin, peyre her sê nusxeyên destnivîs ên Mewlûdê yên ku di arşîva Jaba de cih digirin bidin nasandin û herî dawî jî em dê bi rêbaza berawirdkirinê, li ser van nusxeyan analîzeke berfireh bikin. Di vê analîzê de em dê nîrxê nusxeyan tesbît bikin, şecereya tîkiliyên wan derxin meydanê û cihê arşîva Jaba di nav destnivîsên mewlûda Bateyî de îfade bikin. Gotar dê bi beşên encam û çavkaniyan biqede. Di dawiya gotarê de jî wêneyên rûpelên destpêk û dawiyê yên her sê nusxeyan dê bînin parvekirin.

1. MELAYÊ BATEYÎ Û MEWLÛDA WÎ

Derheqê jiyana Melayê Bateyî de agahiyên teqez ên ku xwe dispêrin jêderên nivîskî tunene. Bateyî demeke dirêj, wek helbestvanê sedsala XVem hatiye nîşandan. Çavkaniya vê nêrînê “Rîsaleya Şa’ir û Musennefên di Kurdistanê” ye ku ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye nivîsîn û ji aliyê A. Jaba ve di sala 1860î de li Lenîngradê hatiye çapkirin. Li gor vê rîsaleyê Bateyî, di navbera salên 820-900 (1417-1495)an de jiyaye (Bazîdî, 2010, r. 13). Piştî çapkirina vê rîsaleyê gelek nivîskaran di destnîşankirina serdema Bateyî de ev zanyarî dubare kirine. Lêbelê hin argumanên ku vê zanyariyê şaş derdixin, vê dawiyê ji aliyê Doskiyan ve hatine destnîşankirin. Li gor van argumanên ku ji zanyariyên

malbatî û hin nîşaneyên tarîxî hatine bidestxistin, bi rehetî dikare bê gotin ku Bateyî di dawiya sedsala hevdehem de hatiye dinyayê û heta bi çaryeka sêyem ji sedsala hijdehem jiyaye (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 21-26; Herweha bnr. Sadînî, 2010, r. 21-30).

Dîsa her çiqas navê Melayê Bateyî, di gelek çavkaniyên berê de wek Ehmed (Bazîdî, 2010, r. 13; Amêdî, 1998, r. 190-191; Azîzan 1998, r. 813; Kurdo, 1992. r. 65) û di hinan de jî wek Hesên (Ertûşî, 1323) hatibe bikaranîn jî navê wî yê rastî Huseyn e. Ev jî ji zanyariyên malbata wî û hin qeydên nivîskî tê bidestxistin (Sadînî, 2015, r. 7-8).

Çawa ku ji nîsbeta wî ya bi bal Bateyê tê fêmkirin, Melayê Bateyî ji gundê Bateyê ye. Ev gund dikeve rojhilatê Beytuşşebabê (Elke). Eşîra wî jî eşîra Ertûşîyan e. Navê bavê wî Mela Mustafa ye. Mela Mustafa bi eslê xwe ji gundê Batuyan e ku niha li ser Şîrnexê ye. Ew û sê birayên xwe ji wir çûne devera Zaxoyê li gundê Bazîngîrê li nav Mamîzdînan bi cih bûne, piştê jî wir jî çûne û li gundê Bateyê bi cih bûne. Bi navê Osman, Ehmed, Mihemed sê birayên Melayê Bateyî û bi navê Mela Ehmed apekî wî hebûye (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 19-21).

Melayê Bateyî, li cem apê xwe Mela Ehmed dest bi xwendinê kiriye, li Hekkarî di medreseya mîrgehê de perwerdeya xwe xilas kiriye, piştê jî li gundê Pîrosayê ku nêzî Bateyê ye, dest bi melatîyê kiriye. Bateyî, li gundê Pîrosayê, bi xanimêke bi navê Hemayîl re zewiciye. Kurekî wî yê bi navê Mela Tahir û kurekî Mela Tahir yanî neviyekî wî yê bi navê Mela Dirbas hebûye (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 19-21). Li gor hinek rîwayetan (Zêrevanî, 2002) bi navê Asmîn, Zulfê û Banê sê keçên Melayê Bateyî jî hebûne.

Ji Melayê Bateyî menzûmêyeke dînî (Mewlûd), li gor hin çavkaniyan (Kurdo, 1992. r. 65) menzûmêyeke evînî (Zembîlfiroş), bi qasî diwançeyekê helbest û berhemeke pexşan a bi zimanê erebî (Hemail) gihîştine me. Melayê Bateyî, di van berhemên xwe de peyva “Bateyî” wek mexles bi kar anîye ku forma nîsbetê ya gundê wî ye. Bateyî di edebiyata Kurdî ya Kurmancî de wek nûnerê herî girîng ê edebiyata dînî tê qebûlkirin. Lewra wî hem tewhîd û ne’tên orjînal nivîsîne, hem jî di tarîxa edebiyata kurdî de di cureya mewlûdê de berhema yekem nivîsiye. Di mewlûda Bateyî de ji xulqiyeta nûra Pêxember heta bi sê saliya wî li ser Cenabê Pêxember hatiye rawestan. Her çiqas jimara beşan û sernavên ku hatine bikaranîn, li gor nusxeyan hin cudahiyan erz bikin jî di tevan de heman naverok heye (Ji bo agahiyên berfireh derheqê naveroka Mewlûda Bateyî de bnr. Kızıllı, Şîngar û Çetin, 2015, r. 53-97).

2. NASANDINA NUSXEYAN

Çawa ku di destpêkê de hat gotin, di Koleksiyona Jaba de sê nusxeyên Mewlûda Melayê Bateyî cih digirin ku wek Kurd 7, Kurd 9 û Kurd 33b hatine binavkirin. Di vê beşê de em dê li ser nasandina van nusxeyan rawestin. Di zanista destnivîsariyê de nasandina nusxeyên destnivîs di çarçoveya rêbazeke taybet de tê kirin ku ev rêbaz li nav Rojhilatnasan wek “notice du manuscrit” û li nav ereban wek “wesfu’l-mextût” hatiye binavkirin (Binbîn û Tûbî 2005, r. 386). Tirkên jî têgeha “nüsha tavsifi”, yan jî “nüsha tanıtımı” bi kar anîne, ku ev tev nasandina nusxeyê îfade dikin. Di tewsîfa nusxeyê de şabloneke tradîsyonel heye ku pêwîst e nusxeya destxet, li gor wê şablonê bê nasandin. Xalên ku di vê şablonê de cih digirin, ji aliyê derekî yê nusxeyê ber bi aliyê navekî ve tên rêzkirin (Ji bo agahiyên berfireh derheqê tewsîfa nusxeyan de bnr. el-Munecid, 1976; Kavakçı, 1991, r. 23-25; Bilgin, 2013, r. 369-373). Em ê jî ji bo nasandina her sê nusxeyan pêşî serî li vê rêbazê bidin û şablona klasîk a tewsîfa nusxeyê amade bikin. Li vir divê bê gotin ku Kurdologa Rûs Margarîta B. Rudenkoyê hemû destnivîsên ku di arşîva Jaba de cih digirin tewsîf kirine û ew bi şeweya katalogekê çap jî kirine (Rudenko, 1961). Lêbelê hem di kataloga Rudenkoyê de xalên ku di şablona tewsîfa nusxeyê de cih digirin hindik in hem jî zimanê katalogê rûsî ye. Loma em ê li vir jî nû ve tewsîfa her sê nusxeyên Mewlûdê bi awayekî berfirehtir û bi Kurmancî amade bikin. Lêbelê ji ber ku nusxeyên orjînal li Rûsyayê di Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê de ne û di destê me de tenê nusxeyên wan ên dijîtal hene, em ê zanyariyên hin xalan di çarçoveya nusxeyên dijîtal de pêşkêş bikin ku di serê van xalan de taybetiyên bergê, filîgrana kaxezê û ebadên kaxezê tên. Aşkera ye ku ji bo bidestxistina encameke tam, pêdivî bi dîtina nusxeyên orjînal heye. Ji ber ku di kataloga Rudenkoyê de ebadên kaxezê hene, me di vê xalê de xwe spart zanyariyên Rudenkoyê. Ji ber ku dijîtalên wan rengîn in, dikare bê gotin ku heta astekê di rengê kaxezan de jî îsabet hatiye bidestxistin. Lêbelê heta orjînalên nusxeyan neyên dîtîn, îsabetkirina di zanyariyên berg û filîgranê de pir zehmet e. Loma di tewsîfê de em ê cih nedin van her du xalan. Ji bilî van awarteyan di tevahiya xalên din ên tewsîfê de zanyariyên rast û durist hatine bidestxistin. Di beşa peyrew de li ser esasê zanyariyên tewsîfa nusxeyan, em dê li ser van her sê nusxeyan, analîzeke berfireh bikin.

2. 1. Tewsîfa Nusxeya Kurd 7ê

1. **Navê berhemê** : Mewlidu'n-Nebî
2. **Te'lîf, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Melayê Bateyî
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê
6. **Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba

7. **Pirtûkxane no** : Kurd 7
8. **Navê xwedî** : Feqî Mustefa
9. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
10. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
11. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
12. **Rengê kaxezê** : Zer
13. **Jimara wereqan** : 30
14. **Ebadên kaxezê** : 25x15 (18x11,5)
15. **Cureya xetê** : Şexsî
16. **Îmla** : Bi hereke ye.
17. **Murekkeb** : Reş û sor
18. **Cedwel** : Li dora misrayên yekem cedwelek û li dora misrayên duyem jî cedweleke din hatiye danîn. Di cedwelê de tenê xêzek hatiye bikaranîn. Ji bo ku cedwel ji nivîsê bê cudakirin, bi murekkeba sor hatiye xêzkirin.
19. **Serlewhe** : Di serlewheyê de bi zimanê erebî navê berhemê hatiye nivîsîn: "*Haze Mewlidu'n-Nebiyî Sellallahu 'Eleyhî we Sellem*" Ji bilî vê nivîsê di serlewheyê de tu motif, yan jî neqş cih nagirin.
20. **Besmele** : Heye
21. **Jimara beşan** : 18
22. **Sernav** : 17 sernav hene. Beşa destpêkê bê sernav e.
23. **Jimara beytan** : 555
24. **Jimara rîzan** : 10
25. **Peyva te'qîbê** : Heye
26. **Cihê istînsaxê** : Erzirûm
27. **Qeyda istînsaxê** : Di dawiya berhemê de qeyda istînsaxê heye: "*Nemmeqehû Muhammed el-Muksî min qebîlet el-Hekkarî fî beled Erzurûm we temme ey hazihî el-Mewlûd fî leylet es-Sulesa li ecl Feqî Mustefa We 'esluhu milliyyun We meskenehû el-an fî beled Erzirom xefereallahû lehû we li walidahû we li katibî hazihî 'n-nusex*"

we cemi' el-Mu'minîn we'lmu'minat we'l-muslimîn we'l-muslimat, amîn fî 1206. 2/3"

28. **Tarîxa istînsaxê** : 1206 H. (1791-92 M.) 2/3
29. **Cihê istînsaxê** : Erzîrûm
30. **Navê mustensix** : Muhemmed el-Muksî (Mihemedê Miksî)
31. **Temelluk** : Feqî Mustefa
32. **Hamiş/derkenar** : Sernavek li hamişê hatiye nivîsîn (10a)
33. **Destpêka destxetê** : Hemdê bê hed bo Xudaê 'alemîn
34. **Dawiya destxetê** : Bo feqîrê Bateî el-Fatîhe

2. 2. Tewsîfa Nusxeya Kurd 9ê

1. **Navê berhemê** : Kitabu Mewlida Şerif
2. **Te'lîf, tercume, şerh** : Te'lîf
3. **Navê nivîskar** : Melayê Bateyî
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. **Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd 9
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
10. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
11. **Zehriye** : Zehriye heye. Di zehriyeyê de navê berhemê, zimanê berhemê û dîroka nivîsîna berhemê cih digirin. Herwiha bi qelemeke cuda wergera van agahiyan bi zimanê frensî hatiye nivîsîn.
12. **Rengê kaxezê** : Bej
13. **Jimara wereqan** : Berhem li gor rêzbendîya pirtûkên çapkirî û bi jimarên erebî hatiye jimarekirin. Li gor vê berhem ji 261 rûpelan pêk tê. Di vê rêzbendîyê de zehriye nehatiye jimarekirin. Herwiha rûpelên milê çepê, vala hatine hiştin. Yanî li ser wan tiştek nehatiye nivîsîn. Eger em vê li ber çavan bigirin, rûpelên berhemê dê dakevin 130î. Li gor sîstema wereqan berhem ji wereq 1a dest pê dike û bi wereq 131b diqede. (1a-

131b). Eger em aliyên vala nehesibînin ev dê dakeve 65 wereqan.

14. Ebadên kaxezê : 24x18 (16x6)
 15. Cureya xetê : Nesx
 16. Îmla : Bi hereke ye.
 17. Murekkeb : Murekkeba reş hatiye bikaranîn.
 18. Serlewhe : Di serlewheyê de bi zimanê erebî navê berhemê hatiye nivîsîn: “*Haze Mewlidu'n-Nebiyî Sellallahu 'Eleyhî we Sellem*”
 19. Besmele : Heye
 20. Jimara beşan : 18
 21. Sernav : 17 sernav hene. Beşa destpêkê bê sernav e.
 22. Jimara beytan : 509
 23. Jimara rêzan : 8
 24. Peyva te'qîbê : Heye.
 25. Cihê istînsaxê : Erzirûm
 26. Qeyda istînsaxê : Di dawiya berhemê de qeyda istînsaxê heye: “*Temmet Mewlida Nebî fî yed Mehmûd Efendî li ecl Mosyo Jaba fî beled Erzirûm fî sene 1274*”
 27. Tarîxa istînsaxê : 1274 H (1857-58 M)
 28. Cihê istînsaxê : Erzirûm
 29. Navê mustensix : Mela Mehmûdê Bayezîdî
 30. Temelluk : Mosyo Jaba (A. Jaba)
 31. Destpêka destxetê : Hemdê bê hed bo Xudaê ‘alemîn
 32. Dawiya destxetê : Bo feqîrê Bateî el-Fatîhe
- 2. 3. Tewsîfa Nusxeya Kurd 33byê**
1. Navê berhemê : Mewlûd
 2. Te'lîf, tercume, şerh : Te'lîf
 3. Navê nivîskar : Melayê Bateyî
 4. Cih (bajar û dewlet) : Lenîngrad, Rûsya
 5. Navê Pirtûkxaneyê : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
 6. Koleksiyon : Koleksiyona A. Jaba

7. **Pirtûkxane no** : Kurd 33b
8. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
9. **Taybetiyên bergê** : Ji ber ku di serî û dawiya berhemê de wereqên kê m hene, derheqê bergê orjînal de tiştek nayê zanîn. Lêbelê di çarçoveya te'mîra berhemê de jê re bergêkî kaxezî hatiye çêkirin.
10. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
11. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
12. **Ziman** : Kurdî (Kurmancî)
13. **Rengê kaxezê** : Zerê kayê
14. **Rizîbûna kaxezê** : Hemû wereqên kaxezê ji kenaran ve rizî ne, yan jî ji aliyê kurman ve hatine xwarin.
15. **Te'mîra kaxezê** : Kenarê çepê yê çar wereqên dawî hatine te'mîrkirin û bi kaxezeke cuda hatine temamkirin. Ji ber vê "han" a peyva "der cihan" û peyva "ne'îma" jê çûne (20a).
16. **Jimara wereqan** : Berhem tev de ji 20 wereqan pêk tê, bi rûyê a'yê dest pê dike û bi rûyê b'yê diqede. Di binê rûyê a'yan de jimar piştê bi qelemzîreçê hatine danîn.
17. **Ebadên kaxezê¹** :
18. **Cureya xetê** : Nesxeke taybet.
19. **Îmla** : Nivîs xweş e û bi hereke ye. Bi îhtîmaleke mezin ji ber ku dirûtina wereqên berhemê xweşik çê nebûye, herfên dawiyê yên milê rastê û herfên destpêkê yên milê çepê tam nayên dîtîn û xwendin.
20. **Murekkeb** : Di tevahiya berhemê de tenê murekkeba reş hatiye bikaranîn. Li gelek cihan murekkeb heşiviye.
21. **Cedwel** : Li dora misrayên yekem cedwelek û li dora misrayên duyem jî cedweleke din hatiye danîn. Bi vî awayî dirûvê du sitûnan pê dikeve. Di cedwelê de du xêz hatine bikaranîn.
22. **Jimara rêzan** : Pênc rûpel 10, çardeh rûpel 9, şazdeh rûpel 8, pênc rûpel 7 rêz in. Nîvekiya wan dike 8 rêz.

¹ Di kataloga Rudenkoyê de tune.

- 23. Jimara beytan** : Beytên heyî yên vê nusxeyê 339 in. Lêbelê rûpela 19ayê ku ji neh beytan pêk tê, di 21ayê de bi şaşî hatine dubarekirin. Loma jî rûpela berî 21ayê (20b) ne ji 21ayê, ji 21byê dewam dike. Dema em neh beytên dubare derdixin, beytên vê nusxeyê dadikevin 330î.
- 24. Peyva te'qîbê** : Heye
- 25. Mutale'e û teshîh** : Hene.
- 26. Hamîş/derkenar** : Di hamîş û derkenaran de hin sererastkirin, beytên ne ji Mewlûdê û hin selewatên bi zimanê Erebi hene.
- 27. Destpêka destxetê** : Nê hezaran sal(i) çûne axirî
- 28. Dawiya destxetê** : Xweş li pey me mulhidanê bê eman

3. ANALÎZA NUSXEYAN

Di vê beşê de em dê li ser esasên zanyariyên ku di beşa danasîna nusxeyan de (tewsîfa nusxeyê û dabeşkirin) hatine dayîn, her sê nusxeyên Mewlûda Bateyî yên ku di arşîva Jaba de cih digirin, analîz bikin. Di vê analîzê de em dê pêşî nîrxê her sê nusxeyan tesbît bikin, piştê şecere/şemaya têkiliyên wan derxin meydanê û herî dawî jî cihê arşîva Jaba di nav destnivîsên mewlûda Bateyî de îfade bikin.

3. 1. Nîrxê Wan

Di zanista destnivîsariyê de nîrxê nusxeyan, bi xalên wek tambûn, fêmarî, dêrînî û hebûna teshîhan tê pîvan. Ev jî ji îfadeyên destpêkê û dawiyê, qeyda istînsaxê (dîrok û cihê nivîsîna nusxeyê û nivîserê nusxeyê), kaxez, îmla, hamîş û hwd. tê fêmkirin ku ev tev di tewsîfa nusxeyê de cih digirin (Bergsträsser, 2011, r. 1; Esîlan, 1994, r. 131-134). Li vê derê em dê hewl bidin ku di çarçoveya van xalan de nîrxên her sê nusxeyan derxin meydanê.

Eger em pêşî ji aliyê tambûnê ve li wan binêrin, em ê bibînin ku nusxeyên Kurd 7 û Kurd 9 tam in, yanî ji destpêkê heta dawiyê bi awayekî yekpare gihiştine roja me. Heçî Kurd 33 b ye ew ne tam e, di destpêkê û dawiya wê de wereqên kême hene. Loma jî aliyê tambûnê ve nîrxên Kurd 7 û Kurd 9ê ji nîrxê Kurd 33byê bilindtir in.

Ji aliyê qeyda istînsaxê ve jî rewş hevterîbê rewşa tambûnê ye. Di her du nusxeyên tam de (Kurd 7 û Kurd 9) ji ber ku rûpela dawî gihiştîye me, qeydên istînsaxê jî cih digirin û di nusxeya ne tam de ku Kurd 33b ye ji ber ku rûpela dawî tune ye, qeyda ketebe/istînsaxê tune ye, yan jî negihiştîye me. Bêguman hebûna qeydên istînsaxê nîrxê Kurd 7 û Kurd 9ê gelekî bilin dike. Lewra ev qeyd derheqê van nusxeyan de agahiyên girîng bexşî me dike. Ji van agahiyan a herî girîng dîroka istînsaxê ye. Nusxeya Kurd 7ê di 1206ê hicrî de ku beramberî

1791-92ê mîladî tê, nusxeya Kurd 9ê jî di 1274ê hicrî de ku beramberî 1857-58ê mîladî tê hatine istînsaxkirin. Li gor vê Kurd 7 ji Kurd 9ê bi 66 salan kevintir e. Ji ber ku Kurd 7 ji Kurd 9ê kevintir e û herwiha jê re bûye binema, nîrxê wê jî ji yê Kurd 9ê zêdetir e.

Agahiyeke din a ku di qeyda istînsaxê de cih digire, cihê istînsaxê ye. Dema ku em ji vî aliyê ve lê dinêrin, em dibînin ku her du nusxe (Kurd 7 û Kurd 9) jî li bajarê Erzîrûmê hatine istînsaxkirin. Ev her du nusxe, ji ber ku cihê bajarê Erzîrûmê di dîroka rewşenbîriya Kurdî de derdixin meydane xwedî nîrx in.

Di qeyda istînsaxê ya her du nusxeyan de derheqê mustensixan û xwediyê nusxeyan de jî agahî hatine dayîn. Kurd 7 ji aliyê Mihemedê Muksî ve ji bo kesekî bi navê Feqî Mustefa; Kurd 9 jî ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve ji bo Mosyo Jaba (A. Jaba) hatine istînsaxkirin. Di Kurd 7ê de Feqî Mustefa û di Kurd 9ê de jî Jaba dibin xwediyê nusxeyan. Mustensixê Kurd 7ê derheqê xwediyê nusxeyê -Feqî Mustefa- de hin agahî jî dane. Li gor vê Feqî Mustefa bi eslê xwe ji eşîra Millî ye û di esnayê nivîsîna wê nusxeyê de îqameta wî Erzîrûm e. Li gor vê teqrîbî 250 sal berî niha li bajarê Erzîrûmê berhemên edebî hatine istînsaxkirin û ji devera Miksê û ji eşîra Millî hin kurd niştecihên wî bajarî ne. Ev her du nusxe, ji ber ku van agahiyên dîrokî û civakî vedigirin xwedî nîrx in.

Eger em bînin ser nusxeya sêyem a mewlûda Bateyî ku di koleksiyona Jaba de cih digire (Kurd 33b), ji ber ku ev nusxe bi tevahî negihîştî ye me, mixabin em nikarin nîrxandîneke tam li ser wê bikin. Berî her tiştî di wê nusxeyê de wereqa dawî tune ye û di encamê de em derheqê tarîxa te'lîf/istînsaxa wê berhemê de, herwiha derheqê cihê istînsaxa wê de nikarin bibin xwedî agahî. Bêguman ev yek nîrxê wê nusxeyê dadixîne. Digel vê jî di çarçoveya wereqên heyî de, em dikarin derheqê serdema wê nusxeyê de hin şîrove û analîzan bikin: Ji ber hebûna çend nîşaneyan, ev nusxe ji her du nusxeyên din kevintir dixuye. Nîşaneya yekem rewşa kaxezê ye. Ji rizîn û peritîna kaxezê, herwiha jî te'mîra ku li ser kaxezê hatiye kirin, tê fêmkirin ku ev nusxe di nav van her sê nusxeyan de ya herî kevin e. Nîşaneya duyem ew e ku di metna heyî ya wê nusxeyê de bi awayekî sistematîk sernav nehatine bikaranîn. Tenê di beşekê de sernavek heye ku ew jî "Întîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem be Amîne" ye. Ji bilî vê di beşa "Amedenê Ebdulmettelib ez Ke'be" de jî ji bo sernavê, cih vala hatiye hiştin, lêbelê sernav nehatiye nivîsîn. Ev jî bi me dide hizirkirin ku ev nusxe ji her duyên din yê ku di wan de bi awayekî sistematîk, sernav hatine bikaranîn kevintir e. Lewra bi piranî nusxeyên dereng ji yê zû birêkûpêktir in. Mustensixan bi awayên curbicur di wan de çaksazî kirine (Bergsträsser, 2011, r. 85-86). Loma Kurd 33bya ku bê sernav e, dibe ku ji Kurd 7 û Kurd 9ên bisernav kevintir be. Nîşaneya sêyem jî taybetiyên wê yê paleografîk in ku li gor Cewdet Huşyar ev taybetî, nusxeyê dixin malê sedsala hijdehem (Huşyar, 29. 10. 2013). Li gor van nîşaneyan, tarîxa nivîsîna wê de vegere berî tarîxa 1791-92yan ku tarîxa istînsaxa Kurd 7ê ye. Ev qonaxa tarîxê jî berê me dide serdemeke girîng ku ew jî serdema jiyana nivîskarê Mewlûdê,

Melayê Bateyî ye. Çawa tê zanîn ku Melayê Bateyî heta bi çaryeka sêyem a sedsala XVIIIem jiyaye. Li vir bivênevê ev pirs tê bîra mirov: Gelo nabe ku ev nusxe nusxeya muellif bixwe be. Bêguman em nikarin vê yekê bi teqezî piştrast bikin. Lêbelê em dikarin bibêjin ku ev nusxe yek ji nusxeyên herî kevin ên mewlûda Bateyî ye; dibe ku nusxeya muellif bixwe be, dibe ku di serdema muellif de li ber nusxeya muellif hatibe kopîkirin û dibe ku piştî wefata muellif ne bi gelekî, li ber nusxeyeke din hatibe istînsaxkirin.

Ji aliyê îmlayê ve jî nusxeya Kurd 33b nusxeyeke xwedî nirx e. Lewra dema mirov wê bi Kurd 7ê re berawid dike, derdikeve meydanê ku îmlaya wê ji îmlaya Kurd 7ê û bi awayekî siruştî ji ya Kurd 9ê jî duristtir e. Li jêr bi awayî kategorîk, îmlaya her du nusxeyan hatiye berhevkirin:

1. Di Kurd 33byê de hin edat/gire li gor standarda îmlayê ji peyvan cuda, di Kurd 7ê de bi peyvan re zeliqandî hatine nivîsîn. Nimûne:

Kurd 33b

بو چه هر bo çî her (1a)
شعله da (1b)

Kurd 7

بو چه bo çîher (6a)
شله da (6b)

2. Dengdêra “e”yê di Kurd 33byê de li gor standarda îmlayê herfa (e) ye. Lêbelê di Kurd 7ê de şûna wê herfê fethe (ه) hatiye bikaranîn. Nimûne:

Kurd 33b

توبيا ته tobeya teh (3b)
westan e (1a)

Kurd 7

توبيا ت tobeya te (7b)
westane (6a)

3. Dengdêra dirêj (ى) di Kurd 33byê de hatiye nivîsîn, di Kurd 7ê de nehatiye nivîsîn. Nimûne:

Kurd 33b: غیری داری ذی بخوه xeyrê darê jê bixwe (1a)

Kurd 7: غیری دار ذ بخوه xeyrê darê jê bixwe (6a)

4. Di hin cihên Kurd 33byê de kêş têk çûye ku ev jî ji aliyekî ve bi îmlayê ve girêdayî ye. Nimûne:

Kurd 33b

دیت نیسی Dît nivîsî (3a)

Kurd 7

دیت و نیسی dît û nivîsî (7a)

Ji van tevan aşkera tê fêmkirin ku mustensixê Kurd 33byê kesayetekî zana ye, lêbelê yê Kurd 7ê (Muhemmedê Miksî) ne wisa ye. Ev jî nirxê nusxeya Kurd 33byê gelekî bilind dike.

Kurd 33b ji aliyê teshîh/sererastkirin û têbîniyên di hamişan (kenarên vala yên rûpelan) de jî xwedî nirx e. Lewra di vê nusxeyê de gelek teshîh û têbînî hene ku hemû jî di hamişan de hatine nivîsîn. Çawa tê zanîn nusxeyên ku hatine

teshîhkirin û li ser wan têbîniyên curbicur hatine nivîsîn, bi nirx in. Ji ber ku di her du nusxeyên din de rewşeke weha tune, nirxê vê nusxeyê ji yên wan bilindtir dibe. Kurd 33b ji bo bikaranîna hamişan di nav destnivîsên kurdî de wek nimûneyeke girîng derdikeve pêş. Ji bo ku derheqê vê tradîsyonê de hizrekê bide, em dê bi awayekî kategorîk ji van teshîh û têbîniyan çend nimûneyan pêşkêş bikin.

Teshîhên ku hatine kirin, bi piranî bi şaşiyên metna binema re têkildar in. Di hinan de şaşiyên îmlayê hatine sererastkirin. Bo nimûne peyva *ظلمنا* / *Telemna* wek *ظلمنا* / *Zelemna* (3a) hatiye teshîhkirin. *أهو* / *ahû*'ya ku "Elîf" û "Hê"ya wê ji hev dûr hatine nivîsîn, bê valahî ji nû ve hatiye nivîsîn (6b). Di teshîhînan de jî peyvên şaş hatine sererastkirin. Bo nimûne peyva "Ebdullah" wek "Muttelib" (8b) û peyva "der zeman" wek "der cîhan" (19a) hatine teshîhkirin. Herwiha çar beytên kêr ên metna Mewlûdê li hamişan hatine nivîsîn û di dawîya wan de îfadeya "sehh" hatiye bicihkirin (5b, 14b, 17a, 19b). Çawa ku li jor em li ser rawestiyabûn, îmlaya Kurd 33byê jixwe rast û durist bû. Bi van teshîhan kêmasiyên mayî jî hatine sererastkirin. Bi vî awayî jî nusxe ji aliyê îmlaya durist ve gihiştîye asteke bilind.

Têbîniyên vê nusxeyê jî curbicur in. Bo nimûne di du hamişan de du beytên ne ji metna Mewlûdê (bi cureyên cuda yên nivîsê) hatine nivîsîn (6a û 18b). Di du hamişên din de jî bi erebî du selewat hatine nivîsîn (20a û 20b). Ev selewat ji Mewlûda Erebi ya Ibn Hecer hatine wergirtin.

Hin beytên ku di rêzê de neguncîne, di hamişan de hatine temamkirin. Di misraya "Wê şevê wan go du sed jin jê mirin" "jê mirin" li hamişê hatiye nivîsîn (9a). Dîsa di misraya "Dîti Haris ruhnikê wê bûne rêz" de "bûne rêz" li hamişê hatiye nivîsîn (19a, 21a).

Hin peyv û îfade digel ku bê şaşî ne û bi hêsanî tên xwendin, li hamişan ji nû ve hatine nivîsîn: Bo nimûne îfadeya "hûr û xilman" (9a) û misraya "Girt û bir lê hate guh min ew xeber" (14a) bi heman şeweyê dîsa hatine nivîsîn.

Ji bilî van du metnên pexşan ên ne ji mewlûdê jî di nav rûpelên mewlûdê de hatine bicihkirin. Yek ji wan bi osmanî ye û derheqê girîngiya ilmê de ye, yê di jî bi farisî ye û derheqê kirina nimêjê de ye.

3. 2. Berawirdkirina Nusxeyan û Şecereya Wan

Ji bo ku em bikarin têkiliyên navbera her sê nusxeyên arşîva Jaba tesbît bikin û di encamê de şecereya wan derxin, pêwîst e em li ser van nusxeyan analîzeke berawirdî bikin. Ev analîz jî dê di çarçoveya binyad û tertîba berhemê (destpêk û dawîya berhemê, navê berhemê, tambûna berhemê, qeyda istînsaxê, beşên wê, sernavên wan, jimara beytan û hwd.) û ziman û îmlaya berhemê ve bê kirin ku ev tev di heman demê de di şablona tewsîfa nusxeyê de jî cih digirin. Loma berawirdkirina nusxeyan ji aliyekî ve berawirdkirina şablona tewsîfa nusxeyan e. Piştî vê berawirdkirinê, eger di navbera du nusxeyan de wekhevîyeke tam

hebe, bi taybetî eger ev wekhevî şaşiyên jî vegire, ji wan ya zû ji ya dereng re dibe binema, ya dereng jî dibe kopyaya wê (Ji bo agahiyên berfireh derheqê berawirdkirina nusxeyê de bnr. Esîlan1994; el-Munecid 1976; Togan1985, r. 86-88). Piştî berawirdkirinan, nusxeyên ku xwediyê têkiliyeke bi vî rengî ne û yên ku ne wisa ne, tên tesbîtkirin û bi vî awayî şaxên nusxeyan û şecereya wan tên bidestxistin. Di nav destnivîsên Mewlûdê yên arşîva Jaba de ji ber ku tarîxa nivîsînê ya Kurd 7 û Kurd 9ê heye û tarîxa nivîsîna Kurd 33byê tuneye, pêşî berawirdkirina Kurd 7 û Kurd 9ê guncawtir dixuye.

3. 2. 1. Berawirdkirina Kurd 7 û Kurd 9ê

Dema em li van her du nusxeyan dinêrin, berî her tiştî em dibînin ku di her duyan de jî qeydên istînsaxê hene. Dema em li zanyariyên qeyda istînsaxê dinêrin, em dibînin ku di cihê istînsaxa van her du nusxeyan de hevbeşiyek heye ku ew cih jî bajarê Erzurûmê ye. Ji ber ku her du nusxe jî li Erzurûmê hatine istînsaxkirin (pêşî Kurd 7 ji aliyê Muksî ve, piştî Kurd 9 ji aliyê Bazîdî ve), wek ihtîmal tê hişê mirov ku Bazîdî li Erzurûmê nusxeya Kurd 7ê bi dest xistiye û nusxeya xwe li ber wê zêde kiriye. Di vê rewşê de Kurd 7 ji Kurd 9ê re dê bibe binema. Bêguman eger cihê istînsaxa wan cuda bûya, di destpêkê de ev hizir û pêşqebûl qet dê nehatiba hişê me. Hevbeşiya wan a di cihê istînsaxê de di gihiştina encamê de bi tena serê xwe ne diyarker jî be, derheqê hebûna têkiliyeke bi vî rengî de hizrekê dide me.

Ji bo ku em encameke teqez bi dest bixin, divê em li xalên din temaşa bikin. Ji aliyê tertîba nusxeyan ve em dibînin ku di destpêka her du nusxeyan de di serlewheyê de ji bo berhemê heman nav hatiye nivîsîn: “Haza Mewlidu’-Nebiyî Sellallahu ’Eleyhî we Sellem”. Destpêk û dawiya berhemê di her duyan de wek hev e. Her du jî bi “*Hemdê bê hed bo Xudaê ‘alemîn*” dest pê dikin û bi “*Bo feqîrê Bateî el-Fatîhe*” diqedin. Her du jî li gor sîstema beşan hatine dabeşkirin û di her duyan de li jor beşan jî sernav hatine bikaranîn. Di her duyan de jî beşa yekem bê sernav e.

Bêguman hevbeşiyên jorîn têkiliya di navbera van her du nusxeyan de xurt dikin, lêbelê têra encameke tam nakin. Loma em ê her du nusxeyan, ji aliyê jimara beşan, sernavên wan û jimara beytan jî berawird bikin. Li jêr em dê sernavên ku di van beşan de hatine bikaranîn, digel jimara beytên ku di beşan de cih girtine, di nav tabloyekê de pêşkêş bikin.

Nusxeya Kurd 7ê

Beş		Sernavên Beşan	Jimara Beytan
Beşên Durist	Beşên Aşkera		
1	1	Di vê beşê de sernav tuneye.	11 beyt
2		Di vê beşê de sernavek (Der Beyanê Fedâ'ilê Mewlûdê Muhammed Sellallahu 'Eleyhi we Sellem) heye, lêbelê ser wê hatiye xêzkirin. Loma wek sernavekî betalkirî dixuye.	13 beyt
3	2	Der Beyanê Fedâ'ilê Mewlûdê Muhammed Sellallahu 'Eleyhi we Sellem.	21 beyt
4	3	Beyanê Ibtidâê Nurê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	33 beyt
5	4	Der Beyanê Xulqê Adem 'Eleyhî we Sellem.	39 beyt
6	5	Der Beyanê Amedenê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	11 beyt
7	6	Der Beyanê Bûdenê 'Ebdullah we Intîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	34 beyt
8	7	Der Beyanê Sebeb Dadenê Weheb Amîne li Ebdullahî Dehed.	20 beyt
9	8	Der Beyanê Întîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	50 beyt
10	9	Der Beyanê Waqî'atê Muddetê Heml.	25 beyt
11	10	Der Beyanê Wîladetî Ba Sa'det Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	25 beyt
12	11	Haza Mekan el-Merheba Sahîbuhu Feqî Mustefa.	10 beyt
13		Ji sernavê re cih nehatiye çêkirin. Tenê di nav valahiya rêzê ya asayî de cedweleke ku nivîs tê de negunce heye. Loma ev der wek beşeke serbixwe naxuye.	18 beyt

14	12	Amedenê ‘Ebdulmutilib ez Ka‘be Be Nezdê Amîne.	21 beyt
15	13	Amedenê Halîme û Bordenî Muhammed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	83 beyt
16	14	Beyanê Weqîatî ki der Meyanê Benî Se‘dî Peyda Bûde.	67 beyt
17	15	Baz Awardenê Helîme Muhammed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	49 beyt
18	16	Der Beyanê Munacat we Xetmi‘l-Kîtab.	25 beyt

Tablo 1: Şêweya dabeşkirina Kurd 7ê**Nusxeya Kurd 9ê**

Beş	Sernavên Beşan	Jimara Beytan
1	Di vê beşê de sernav tune.	11 beyt
2	Der Beyanê Feda‘ilê Mewlûdê Muhammed Sellallahî ‘Eleyhî we Sellem (Ev sernav ji Kurd 7ê hatiye wergirtin. Lêbelê digel ku di Kurd 7ê de ser wê hatiye xêzkirin û bi vî awayî şaşiya wî sernavî hatiye ferqkirin, ev li ber çavan nehatiye girtin û heman sernav hatiye kopîkirin. Sernavê durist pêwist e “Der Medhê Muhammed Sellallahu ‘Eleyhi we Sellem” be.)	13 beyt
3	Der Beyanê Feda‘ilê Mewlûdê Muhammed Sellallahî Te‘ala ‘Eleyhî we Sellem.	21 beyt
4	Beyana Îbtîdaya Nura Muhammed Sellallahu Te‘ala ‘Eleyhî we Sellem.	32 beyt
5	Der Beyanê Xilqetê Adem ‘Eleyhî Selam.	39 beyt
6	Der Beyanê Amedenê Nûrê Muhammed Sellallahu Te‘ala ‘Eleyhî we Sellem.	11 beyt
7	Der Beyanê Bûdenî ‘Ebdullah we Întîqalî Nûrî Muhammed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem.	34 beyt
8	Der Beyanê Sebeb Dadenê Weheb Amîne li Ebdullah dad û	20 beyt

	şod.	
9	Der Beyanê Întîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	50 beyt
10	Der Beyanê Waqî'atê Muddetî Heml.	25 beyt
11	Der Beyanê Wîladetê Bacea'detê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî wessellem.	20 beyt
12	Mekanu'l-Merheba li ecli'l-Mustefa.	10 beyt
13	Der Beyanê Mu'cizatê Nebî Sellallahu 'Eleyhî Selam.	18 beyt
14	Amedenê 'Ebdulmüttelîb ez Ka'be Be nezdê Amîne.	21 beyt
15	Amedenê Helîme û Bordenê Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	43 beyt
16	Beyanê Weqîatê kî der meyanê Benî Se'diyan Peyda Bûden.	67 beyt
17	Baz Awardenê Helîme Muhammed Sellallahu 'Eleyhî we Sellem.	49 beyt
18	Der Beyanê Munacat we Xetmî'l-Kîtab.	25 beyt

Tablo 2: Şêweya dabeşkirina Kurd 9ê

Dema mirov bi awayekî sethî lê dinêre, tê zenkirin ku jimarên beşan hev nagirin, lewra di Kurd 9ê de 18 beş, di Kurd 7ê de jî 16 beş dixuyin. Lêbelê eger dahûrîneke baş bê kirin, dê bê dîtin ku ji ber du aloziyan ji Kurd 7ê du sernav daketine û di binemaya xwe de beşên Kurd 7ê jî wek yên Kurd 9ê 18 in. Ji van aloziyan a yekem ew e ku mustensixê Kurd 7ê di beşa 13em de danîna sernavî ji bîr kiriye. Dema ku ev yek ferq kiriye jî di nav valahiya rêzê ya asayî de ji bo sernavê cedweleke teng çê kiriye, lêbelê nekariye di nav wê cedwela teng de sernav binivîse. Mustensixê nusxeya Kurd 9ê (Mela Mehmûdê Bazîdî) di esnayê istînsaxê de ev yek ferq kiriye û di nusxeya xwe de hevterîbê mijara wê beşê sernavê “Der Beyanê Mu'cizatê Nebî” daniye. Yanî herçiqas di Kurd 7ê de beşek kêr dixuye jî di binemaya xwe de kêmasiya wê beşê tune, tenê nivîsîna sernavê wê hatiye jibîrkirin. Aloziya duyem jî ew e ku mustensixê Kurd 7ê ji bo beşa duyem ku mijara wê pesnê Pêxember e, bi şaşî sernavê beşa sêyem (Der Beyanê Feda'ilê Mewlûdê Muhammed) nivîsiye, lêbelê piştî ku ev şaşiya xwe ferq kiriye ji ber ku nekariya wî sernavî jê bibe û yê rast binivîse, ser wê xêz kiriye û ew sernav bi vî awayî betal kiriye. Heman sernav di cihê xwe yê asayî de (beşa sêyem) jî hatiye bikaranîn. Bi vî awayî di beşa duyem de bi awayekî şaş û di beşa sêyem de jî bi awayekî rast heman sernav du caran hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de ji ber ku ji du sernavên wek hev yê pêşî hatiye xêzkirin, mirov zen

dike ku beşa sernavê xêzkirî hatiye betalkirin û ew der dewama beşa berî wê ye. Bi vî awayî digel ku beşa sernavê xêzkirî, beşeke serbixwe ye jî ew beş bi şaşî tê daxistin û ji Kurd 7ê beşeke din jî kêma dibe. Çawa ku hat îzahkirin, eger mirov bi baldarî lê binêre, dê bê dîtin ku beşên vê nusxeyê jî di binemaya xwe de 18 in û her du nusxe di mijara jimara beşan de jî hevbeş in.²

Zêdebarî vê hevbeşiyê di beşa duyem a Kurd 9ê de şûna ku sernavê şaş û serxêzkirî yê Kurd 7'ê bê sererastkirin, heman şaşî hatiye dubarekirin. Bêguman hevgirtina şaşiyên du nusxeyan nîşaneyêke bingeîn e ku ji wan nusxeyan ya dereng li ber ya zû hatiye kopîkirin. Ev jî dibe nîşaneyêke girîng ku Kurd 7 ji Kurd 9ê re binema ye.

Ji bilî hevbeşiya di jimara beşan de, di metnên sernavan de jî hevgirtineke tam heye. Lewra di her duyan de jî sernavek bi erebî yê din tev bi farisî ne. Tenê Bazîdî sernavekî Farisî bi rakirina hin edatên farisî xistiye dirûvê Kurmancî.

Eger em bîna jimara beytan, di vê mijarê de di navbera her du nusxeyan de newekheviyek heye. Lewra jimara beytan di Kurd 7ê de 555 û di Kurd 9ê de jî 509 e. Lêbelê jimara beytên wan ne wek hev jî bin, ji ber ku kêmasiya beytan di nusxeya dereng (Kurd 9) de ye, ev di zanista destnivîsariyê de nabe asteng ku nusxeya zû ji ya dereng re bibe binema. Lewra mustensix dema nusxeya nû kopî dike carinan cihê ku lê maye ji bir dike û beytinan, yan jî rûpelinan diqevêze (Bergsträsser, 2011, r. 74). Li vir jî dema mustensixê Kurd 9ê nusxeya xwe kopî kiriye, di beşa çarem de beytek, di beşa yazdehem de pênc beyt û di beşa pazdehem de jî çil beyt (du wereq), yanî tev de 46 beyt qevastine. Bi kurtî di nusxeya Kurd 9ê de kêmasiya beytan nabe asteng ku ew nusxe kopiya Kurd 7ê be.

Di encama berawirdkirina her du nusxeyan de derdikeve meydanê ku di navbera Kurd 7 û Kurd 9ê de wekheviyeke tam heye. Ev jî berê me dide wê yekê ku nusxeya Kurd 7 ji Kurd 9ê re binema ye û Kurd 9 li ber wê hatiye istînsaxkirin. Piştî ku bi saya vekolîna li ser binyad û tertîba her du nusxeyan derket meydanê ku Kurd 7 ji bo Kurd 9ê binema ye, hevbeşiya wan a cihê istînsaxê jî ku bajarê Erziromê ye, watedartir dibe.

3. 2. 2. Berawirdkirina Kurd 33b û Kurd 7ê

Madem em êdî dizanin ku Kurd 9 kopyaya Kurd 7ê ye, em ê bi awayekî siruştî nusxeya kopyakirî daynin aliyekî û nusxeya binema (Kurd 7) bi nusxeya sêyem a mayî re (Kurd 33b) berawird bikin. Bi vî awayî, em dê hebûn, yan nebûna têkiliyê fêhm bikin û ji bo derxistina şecereyê gava dawî biavêjin.

² Ji ber ku ev hûrgilî li ber çavan nehatine girtin, di weşana rexneyî ya metnê Mewlûda Bateyî de ku bi serpereştîya me ji aliyê Ziver İlhan ve hat amadekirin, beşên nusxeya Kurd 7ê wek 16 hatine nîşandan. (İlhan, 2014, r. 31.)

Dema em li binyad û tertîba Kurd 33byê dinêrin, berî her tiştî netambûna wê balê dikişîne. Ev jî tê wê wateyê ku di vê nusxeyê de qeyda istînsaxê, yanî tarîxa nivîsîna nusxeyê cih nagire. Ji ber vê jî berawirdkirina binyadî girîngiyeke zêde bi dest dixê. Lewra her cure encam tenê bi saya vê berawirdkirinê dê bê bidestxistin. Lêbelê mixabin ji ber ku ev nusxe, bi tevahî negihîştîye me, ne pêkan e em derheqê tevahiya beşên wê de agahiyeke tam bi dest bixin. Eger beyta yekem a ku ev nusxe bi wê dest pê dike (Nê hezaran sal(i) çûne axirî / Ew nebî bû Adem hêj av û herî) li ber çavan bê girtin, dê bê dîtin ku ji serê vê nusxeyê, çar beşên pêşî bi tevahî û destpêka beşa pîncem kêman in. Kojima beytên van beşan teqrîbî 85 in. Dîsa eger beyta dawî ya ku ev nusxe pê diqede esas bê girtin (Dest(i) da şîran û hatin şubhê san / Xweş li pey me mulhidanê bê eman), dê bê dîtin ku çend beytên dawî yên beşa pazdehem û her sê beşên dawî bi tevahî di vê nusxeyê de cih negirtine. Kojima beytên van beşan jî teqrîbî 148 in. Bi vî awayî derdikeve meydanê ku ji vê nusxeyê heft beş bi tevahî kêman in û kojima beytên kêman jî teqrîbî digihîje 233 beytan. Eger em di çarçoveya Kurd 7 û Kurd 9ê de standarta beşên mewlûdê 18 beş qebûl bikin, di dest me de 11 beş dimînin.

Ji ber kêmasiya van beşan em mecbûr in analîzên xwe di çarçoveya beşên heyî de bikin. Dema em ji aliyê dabeşkirin û sernavên beşan ve li metna heyî dinêrin, em dibînin ku di vê nusxeyê de, berevajî her du nusxeyên din, rêbaza dabeşkirinê nehatiye şopandin. Lewra di metna heyî de tenê ji bo beşekê sernav hatiye bikaranîn ku ew jî “Întîqalê Nûrê Muhammed Sellallahu ‘Eleyhî we Sellem be Amîne” ye. Herwiha di beşa “Amedenê Ebdulmettelib ez Ke’be” de jî ji bo sernavê, cihê vala hatiye hiştin, lêbelê sernav nehatiye nivîsîn. Wek encam di çarçoveya metna heyî de em dikarin bibêjin ku di nusxeya Kurd 33byê de bi piranî sernav nehatine bikaranîn, loma jî dabeşkirin ji hev nayê ferqkirin. Ji aliyê dabeşkirinê ve taybetiyeke din a vê nusxeyê ew e ku di vê nusxeyê de, berevajî Kurd 7ê, beşa merhebayê tuneye.

Çawa tê dîtin ku ji aliyê dabeşkirin û sernavan ve tu tîkili di navbera her du nusxeyan de naxuye. Lêbelê digel vê jî divê bersiva vê pirsê bê dayîn: Gelo nabe ku mustensixê Kurd 7ê, digel zêdekirina sernavan nusxeya xwe li ber Kurd 33byê istînsax kiribe? Bêguman ev yek wek teorîk pêkan e, lêbelê di navbera wan de du cudahî hene ku vê îhtîmalê ji holê radikin. Ya yekem ew e ku di Kurd 33byê de beşa merhebayê tuneye, lêbelê di Kurd 7ê de ev beş heye. Ev jî nîşan dide ku Kurd 33b ji bo Kurd 7ê ne binema ye û di navbera wan de tîkiliyek tuneye. Lewra beşeke ku di nusxeya binema de tunebe, divê di nusxeya kopikîrî de jî tunebe. Ya duyem jî ew e ku di navbera îmla û peyvên wan de cudahiyez mezin hene. Li jorê di beşa nîrxên nusxeyan de me ji aliyê îmlayê ve her du nusxe berawird kiribûn û nimûneyên wan pêşkêş kiribûn. Loma li vir em dê çend cudahiyez din jî bi awayekî kategorîk û berawirdî pêşkêş bikin:

1. Hin peyv bi herfên cuda hatine nivîsîn.

Kurd 33b

وخته رابیت Wexte rabit (3b)

ارضی Erdê (2a)

سحرا Sehra (5a)

ذو کەشتن Zû gehîştin (5a)

بو خلا Bû xela (15a)

2. Hin peyv ji hev cuda ne.

Kurd 33b

یا خدایندی فلک Ya Xudawendê felek (1a)

دا ببینی Da bibînê (6a)

سرا عظیم sirra ‘ezîm (7a)

3. Hin peyvyan cih guherandine.

Kurd 33b: هم دی وێ رۆژی ل صیدی بو وهب Hem di wê rojê li seydê bû weheb (6a)

Kurd 7: هم دی رۆژی وێ ل صیدی بو وهب Hem di rojê wê li seydê bû weheb (10 b)

Ev cudahî nîşan didin ku di navbera Kurd 33b ji Kurd 7ê de tu têtîlî tuneye û binemaya Kurd 7ê ne Kurd 33b ye, nusxeyeke nenas e.

3. 2. 3. Şecereya Her Sê Nusxeyan

Di zanista destnivîsariyê de nusxeya binema û kopyaya/kopyayên wê û eger hebin kopyayên kopyayan şaxeke nusxeyan, kojima hemû şaxan jî şecereya nusxeyan saz dikin (Ji bo agahiyên berfireh bnr. Togan 1985, r. 86-88, 90, 92). Di çarçoveya vê dustûrê de berawirdkirin û analîzên jorîn di du xalan de dikarin bên xulasekirin: Ya yekem tu têtîlî di navbera Kurd 33b û Kurd 7ê de tuneye, ev du şaxên cuda ne û li ber binemayên cuda hatine istînsaxkirin. Bêguman ji ber ku xebata me tenê bi sê nusxeyên ku di arşîva Jaba de cih digirin bi sînor e, em li vir nadin pey jêderên wan. Aşkera ye ku ji bo vê yekê divê nusxeyên din ên Mewlûdê ku li jêrê dê bi helkefteke dî, listeya wan bê dayîn, bi heman şeweyê bên analîzkirin. Encama duyem jî ew e ku nusxeya Kurd 9ê li ber Kurd 7ê hatiye istînsaxkirin. Yanî Kurd 7 binema, Kurd 9 jî kopyaya wê ye. Di vê çarçoveyê de şecereya van her sê nusxeyan digel şaxên wê weha dikare bê şematîzekirin:

Kurd 7

وقتە رابیت weqte rabit (8b)

‘عرضی erdê (9b)

صحرا sehra (10a)

زو کەشتن zû gehîştin (10a)


بو غلا bû gela (18a)

Kurd 7

ای خدایندی فلک ey xudawendê felek (6a)

دا ببین da bibîn (10a)

نورا عظیم nûra ‘ezîm (11a)



Şema: Şecereya Nusxeyên Mewlûda Melayê Bateyî yê Koleksiyona A. Jaba

3. 3. Cihê Arşîva A. Jaba di nav Destnivîsên Mewlûda Bateyî de

Ji bo ku em ji aliyê destnivîsên Mewlûda Bateyî ve girîngiya arşîva A. Jaba tesbît bikin û cihê wan di nav nusxeyên din ên Mewlûda Bateyî de derxin meydanê, divê em pêşî ji nusxeyên din ên Mewlûda Bateyî haydar bin. Heta niha gelek lêkolîneran hewl dane ku nusxeyên destnivîs ên Mewlûda Bateyî berhev bikin û Mewlûdê li ser esasê wan nusxeyan ji nû ve biweşînin. Di vî warî de xebata herî dawî ya Ziver Îlhan e (Îlhan, 2014, r. 31). Her çiqas berî Îlhan gelek lêkolîneran (Amêdî, ?.; Zinar, 1992; T. Doskî û M. Doskî, 2005; Sadinî, 2015; Şemrexî, 2011) di weşanên metna Mewlûdê de ji gelek nusxeyên destnivîs sûd wergirtin jî, ji aliyê berhevkerinê ve xebata Îlhan ji ya hemûyan berfirehtir e û pêşketîtir e. Îlhan di teza xwe ya masterê de ku ji metna rexneyî ya Mewlûda Bateyî pêk tê, ji bo ku vê metnê amade bike, heşt nusxeyên destnivîs ên Mewlûdê berhev kirine ku tevahiya van nusxeyan di qonaxa berî Şerê Cihanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin (Îlhan, 2014, r. 31-40). Bêguman nusxeyên Mewlûdê ne ev tenê ne. Ji bilî van nusxeyan gelek nusxe jî di qonaxa piştî Şerê Cihanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin. Xebata Îlhan nusxeyên vê serdemê venegirtine, lêbelê xebata Amêdî ji van nusxeyan du heban (Amêdî, ?, r. 9) û xebata Doskî jî pênc heban (T. Doskî û M. Doskî, 2005, r. 39-40) vedigire. Ji ber ku nusxeyên berî qonaxa şer ji aliyê qidemê ve girîngtir in û nusxeyên arşîva Jaba jî di vê qonaxê de ne, em dê li vir xwe bi wê qonaxê bi sînor bikin û nusxeyên wê qonaxê yê ku ketine lîteraturê tesbît bikin.

Çawa ku berî niha çendî caran hat diyarkirin, di arşîva Jaba de sê nusxeyên Mewlûda Bateyî hene. Ji heşt nusxeyên ku Îlhan di teza xwe de bi kar anîne, du nusxe yê arşîva Jaba ne ku ew jî Kurd 7 û Kurd 9 in. Di xebata Îlhan de Kurd 33b cih nagire. Eger em vê jî li ber çavan bigirin, jimara destnivîsên Mewlûdê dibe neh. Dîsa di xebata Sadiq B. Amêdî de nusxeyeke kevin heye ku ew jî di xebata Îlhan de cih nagire Ev nusxe ji aliyê Hesên el-Îrûnî b. Cangîr el-Binbatî

ve di sala 1871ê de hatiye istînsaxkirin. (Amêdî, ?, r. 9). Bi vî awayî jimara nusxeyan dibe deh. Ji bilî van deh nusxeyan, li Almanya li pirtûkxaneya Staatsbibliothek zu Berlinê jî nusxeyeke Mewlûdê heye (Bateyî, 1854). Digel vê jimara destnivîsên Mewlûdê digihîje yazdehan ku ev tev di qonaxa berî Şerê Cîhanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin. Di tabloya jêrîn de, ji bo ku bi awayekî berawirdî cihê arşîva Jaba di nav nusxeyên Mewlûdê de bê tesbîtkirin, cihên ku ev nusxe lê tînin parastin û eger hebin jimareyên wan û tarîxa ku hatine istînsaxkirin bi hev re cih digirin:

	Cih	Jimare	Tarîx
1	Arşîva Jaba-Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê/Rûsya	Kurd 7	1792
2	Milli Kütüphane-Ankara/Turkiye	06 Hk 4390	1824
3	Îsmâil Taha Şahîn-Dihok/Kurdistan-Iraq	-	1854
4	Staatsbibliothek zu Berlin/Almanya	Ms. or. oct. 1083	1854
5	Arşîva Jaba-Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê/Rûsya	Kurd 9	1858
6	Sadiq B. Amêdî-Dihok/Kurdistan-Iraq	-	1871
7	Z. Gökalp İhtîsas Kütüphanesi-Diyarbakir/Turkiye	21 Hk 1916	1880
8	A. Lec Oq Berlîn	faksimile	1887
9	Hüseyîn Galip Kütüphanesi-Ortahisar/Turkiye	016	1910
10	Arşîva Jaba-Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê/Rûsya	Kurd 33b	?
11	Mela Nûrî-Gundê Batê/Turkiye	-	?

Tablo 3: Nusxeyên Mewlûdê yên berî Şerê Cîhanê yê Yekem

Bêguman li vir em dê ji hemû aliyan ve (dêrînî, binyada berhemê, tesnîf/dabeşkirin, tertîb/rêzbandî, metna berhemê û hwd.) van nusxeyan analîz nekin. Ji ber ku ev gotar bi nusxeyên arşîva Jaba sînorkirî ye, analîzeke bi vî rengî, çawa ku li jorê derbas bû, tenê di her sê nusxeyên arşîva Jaba de hatiye bicihkirin. Teşmîlkirina vî karî li ser nusxeyên din karê gotareke cuda ye. Li vir tenê em dixwazin van nusxeyên arşîva Jaba ji aliyê rêje û dêrîniyê ve bi yê din

re berawird bikin. Dema em ji aliyê rêjeyê ve lê dinêrin, em dibînin ku ji yazdeh nusxeyan sê heb di arşîva Jaba de, lêbelê her yek ji nusxeyên din li cihên cîyawaz cih digirin. Bi gotineke din tenê arşîva Jaba ye ku ji yekê zêdetir nusxê lê têne parastin. Bêguman ev wek taybetiyeke girîng a arşîva Jaba derdikeve pêş.

Ji aliyê dêrîniya nusxeyan ve jî arşîva Jaba girîngiyeke xwe ya taybet heye. Lewra di nav hemû nusxeyan de ya herî kevin di arşîva Jaba de ye. Ew jî Kurd 7 e ku tarîxa nivîsînê 1792 ye. Çawa di tabloyê de jî tê dîtin, nusxeya Kurd 9 jî yek ji nusxeyên kevin dikare bê qebûl kirin. Lewra qet nebe di nîveka listeyê de cih digire. Nusxeya Kurd 33b jî, herçiqas tarîxa nivîsîna wê ne diyar e, dirûvê nusxeyeke kevin pê dikeve.

Di encamê de arşîva Jaba ji yazdeh nusxeyên Mewlûda Bateyî sê nusxeyên kevin vedigire ku yek ji van sê nusxeyan di nav hemûyan de ya herî kevin e. Loma arşîva Jaba di parastina van nusxeyên binirx ên Mewlûda Bateyî de xwediyê roleke mezin e. Eger ev nusxe di wê arşîvê de nehatibana parastin, bi ihtîmaleke mezin, an dê negihiştibana roja me yan jî em dê ji wan haydar nebûna.

ENCAM

Di arşîva A. Jaba de (li Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê) sê nusxeyên Mewlûda Melayê Bateyî hene: Kurd 7, Kurd 9 û Kurd 33b. Ji analîzên ku ji perspektîfa dîsîplîna destnivîsariyê ya li ser van nusxeyan hatin kirin, derket meydanê ku ji van nusxeyan Kurd 7 û Kurd 9 tam in, Kurd 33b jî ne tam e. Hevterîbê vê di Kurd 7 û Kurd 9ê de qeyda istînsaxê heye, lêbelê di Kurd 33byê de tune ye. Ji ber vê jî zanyariyên cih û tarîxa istînsaxê û herwiha kesê ku istînsax kiriye ji bo Kurd 7 û Kurd 9ê di destê me de hene, lêbelê ji bo Kurd 33byê tune ne. Dîsa Kurd 7 û Kurd 9 di qeyda istînsaxê de agahiyên civakî û dîrokî jî vedigirin. Ji van agahiyan tê fêmkirin ku teqribî 250 sal berî niha li bajarê Erzurûmê berhemên edebî yên kurdî hatine istînsaxkirin û ji devera Miksê û ji eşîra Millî kurdên niştecihê wî bajarî hene. Ev tev nirxê Kurd 7 û Kurd 9ê bilind dîkin. Heçî nusxeya Kurd 33byê ye, ew wek Kurd 7 û Kurd 9ê ne tam e, lewra di destpêk û dawîya wê de wêre qên kê m hene. Ev jî dibe sedem ku em ji zanyariyên bîngêhîn ên wek dîrok û cihê nivîsîna vê nusxeyê bêpar bimînin. Lewra ev zanyarî bi giştî di dawîya nusxeyan de cih digirin. Bêguman ev yek jî nirxê vê nusxeyê (Kurd 33b) dadixîne. Lêbelê digel vê jî ev nusxe ji aliyê hin xalên din ve xwediyê nirxekî mezin e. Berî her tiştî ev nusxe ji yên din kevintir dixuye. Lewra kaxeza wê peritî ye û hatiye te'mîr kirin. Herweha şewaza dabeşkirina wê ne birêkûpêk e û ji vî aliyê ve dirûvê nusxeyeke kevin pê dikeve ku piştê di istînsaxên din de hatiye dabeşkirin. Ev nusxe ji aliyê îmlayê ve jî nusxeyeke pir girîng e. Lewra îmlaya wê ji îmlaya Kurd 7ê rasttir û duristtir e. Ji vê jî tê fêmkirin ku mustensixê Kurd 33byê kesayetekî zana ye, lêbelê yê Kurd 7ê (Muhemmedê Miksî) ne wisa ye. Kurd 33b jî aliyê teshîh/sererastkirin û têbîniyên di hamişan (kenarên vala yên rûpelan) de jî xwedî nirx e. Hem bi

teshîhan kêmasiyên heyî hatine sererastkirin, hem jî nusxe bi vê rewşa xwe ji bo bikaranîna hamîşan di destnivîsên kurdî de wek nimûneyeke girîng dikare bê pêşniyarkirin.

Nusxeya Kurd 7ê di 1206ê hicrî/1791-92ê mîladî de ji aliyê Muhemedê Miksî ve û nusxeya Kurd 9ê di 1274ê hicrî/1857-58ê mîladî de ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatine istînsaxkirin. Di encama berawirdkirina van her du nusxeyan de derdikeve meydanê ku Bazîdî nusxeya xwe (Kurd 9) li ber nusxeya Muksî (Kurd 7) nivîsiye. Yanî nusxeya Muksî ji ya Bazîdî re binema ye. Lewra di navbera her du nusxeyan de ji aliyê binyad û tertîbê ve wekheviyeke tam heye. Piştî dahûrîneke kûr derdikeve meydanê ku di Kurd 9ê de sernavên beşan digel şaşiyên xwe bi tevahî hatine kopyakirin. Tenê di jimara beytan de, ji ber ku mustensixê Kurd 9ê hin beyt bi şaşî qevaztine, di navbera wan de newekheviyek dixuye ku ev jî di tradîsyona istînsaxê de tiştêkî asayî ye. Dema du nusxe, şaşî jî di nav de, bi giştî wek hev bin, ji wan ya zû ji ya dereng re dibe binema. Loma jî Kurd 7 ji Kurd 9ê re binema ye. Heçî nusxeya Kurd 33byê ye, tu têkili di navbera wê û nusxeya Kurd 7ê de tune ye û her du jî li ber jêderên cuda hatine istînsaxkirin. Di navbera van her du nusxeyan de cudahiyan girîng hene. Ji van cudahiyan du xal derdikevin pêş. Yek jê ew e ku di Kurd 33byê de beşa merhebayê tune ye, lê di Kurd 7ê de heye. Ya duyem jî ew e ku ji aliyê îmlayê ve di navbera wan de cudahiyan mezin hene. Wek encam ji her sê nusxeyên mewlûda Bateyî yê arşîva Jaba, Kurd 33b û Kurd 7 du şaxên cuda ne. Kurd 9 jî li ber Kurd 7ê hatiye istînsaxkirin.

Ji aliyê destnivîsên mewlûda Bateyî ve girîngiya arşîva A. Jaba gelek e. Ji yazdeh nusxeyên kevin ên mewlûda Bateyî ku di qonaxa berî Şerê Cîhanê yê Yekem de hatine istînsaxkirin, sê heb tenê di arşîva Jaba de cih digirin. Di nav van nusxeyan tevan de ya herî kevin dîsa di arşîva Jaba de ye ku ew jî nusxeya Kurd 7 e. Nişaneyên heyî Kurd 33byê ji wê jî kevintir didin xuyakirin. Ev jî nişan didin ku arşîva Jaba di parastina van nusxeyên xwedî nîrx de roleke mezin listiye.

ÇAVKANÎ

Çavkaniyên Çapkîrî:

- Amêdî, S. B. (?). *Mewlûda Melayê Bateyî*, Hewlêr: Emîndarêtiyê Giştî yê Rewşenbîrî û Lawan, Hewlêr.
- Amêdî, S. B. (1998). *Hozanvanê Kurd*, (Amd. Zeynelabîdîn Zinar), Stockholm: Pencînar.
- Azizan, H. (1998). “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, Stokolm:Nûdem.
- Babê Zêrevanî, (2002). “Mela Hisênê Bateyî-1”, *Nûbihar*, hj. 87, Stenbol.
- Bazîdî, M. M. (2010). “Rîsaleya Şa’ir û Musennefên di Kurdistanê”, *Camî’eya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, Amd. Ziya Avci, Stenbol: Lîs.

- Bergsträsser, G. (2011). *Metin Tenkidi ve Yazma Metinleri Yayınlama İlkeleri*, Yayına Haz. Muhammed Hamdi el-Bekri, Çev. Eyyüp Tanrıverdi, İstanbul: Kitabevi.
- Bilgin, O. (2013). “Yazma” *DIA*, (b. XLIII), İstanbul:DİB Yay.
- Binbîn, E û Şewqî T (2005). Mustefa, *Mu’cem Mustelehat el-Mextût el-‘Erebî*, Merakeş: el-Xizane el-Heseniyye er-Ribat.
- Doskî, T. Î. û Doskî, M. (2005). *Melayê Bateyî Jiyân û Berhem*, Duhok: Spîrêz.
- Ertûşî, H. (1323). *Mewlidun ‘Nebî*, Stenbol:Dersaedet
- Esîlan, E. E. (1994). *Tehqîqu ‘l-Mextûtât beyne ‘l-Waqî’ we ‘n-Nehc el-Emsel*, Riyad: Mektebet el-Melik Fehd el-Weteniyye.
- Îlhan, Z. (2014). *Mewlûda Mela Huseynê Bateyî-Metn û Lêkolîn*, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, t.ç, Mardin: Teza Lîsansa Bilind
- Kavakçı, Y. Z. (1991). *İslam Araştırmalarında Usul*, Ankara: DİB Yay.
- Kızıl, H., Şingâr, C. û Çetin, R. (2015), “Ceribandinek Li Ser Senifandina Mewlûdên Kurdiya Kurmancî Li Gorî Mijarên Wan”, *International Journal of Kurdish Studies*, j.1, Diyarbakır.
- el-Munecid, S. (1976). *Qewa’id Fehreset el-Mextûtât el-‘Erebiyye*, Beyrûd: Dar el-Kitab el-Cedîd.
- el-Munecid, S. (1987). *Qewa’id Tehqîq el-Mextûtât*, Dar el-Kitab el-Cedîd, Beyrûd: Dar el-Kitab el-Cedîd.
- Qenatê Kurdo (1992). *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Ankara: Ozge.
- Pîrbal, F. (2000). *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Hewlêr: Aras.
- Rudenko, M. B. (1961). *Opisanie Kurdskih Rukopisey Leningradskih Sobraniy*, Moskova: Izdatelbstyo Ydstdçnoy Literaturi.
- Sadini, M. X. (2015). *Molla Huseyin-i Bateyî Mevlid-i Şerif/Mewlûda Nebî*, Ankara: Kùltür ve Turizm Bakanlıđı Yay.
- Sadinî, M. X. (2010), *Mela Huseynê Bateyî Jiyân, Berhem û Helbestên Wî*, İstanbul: Nûbihar.
- Şemrexî, H. (2011). *Mewlûd Melayê Bateyî*, Stenbol: Nûbihar.
- Togan, A. Z. V. (1985). *Tarihte Usul*, İstanbul: Enderun Kitabevi.
- Wellek, R. û Warren, A. (1948). *Theoryn of Literature*, New York: Harcourt, Brace and Company .
- Zinar, Z. (1992). *Mewlûd*, İstanbul: Fırat Yay.

Çavkaniyên Destnivîs:

Melayê Bateyî, (1206 H/1791-92 M). *Mewlidu ‘n-Nebî*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneya Gişîfî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 7, Erzirûm: Muhemmed el-Muksî

Melayê Bateyî, (1274 H/1857-58 M) . *Kitabu Mewlida Şerif*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneya Gişîfî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 9, Erzirûm: Mela Mehmûdê Bayezîdî

Melayê Bateyî, (?). Mewlûd, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneyaya Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 33b. ?: ?.

Melayê Bateyî, (1854). Mewlûda Melayê Bateyî, nusxeya dijîtal Staatsbibliothek zu Berlin/Almanya, j. Ms. or. oct.1083. Bitlîs: Salih b. Mustefa.


Çavkaniya Elektronîk:

Huşyar, Cewdet, “Zexaîru’t-Turasi’l-Kurdî fi Xezainî Petersborg”, <http://brob.org/old/bohoth/bohoth/hooth026.Htm>, 29. 10. 2013.

Kurd 7




Rûpela Destpêkê




Rûpela Dawiyê

Kurd 9



Rûpela Destpêkê



Rûpela Dawiyê

Kurd 33b



Rûpela Destpêkê



Rûpela Dawiyê